

Sirûd û

Newroza Min

Muoyed Teyib

Wekî befira
Li ser çiyay
Wekî gula
Li nav giyay
Tu ya "canî" newroza
min

Wek çîroka
Kêzê û dirrikê
Zeng û bengaw
Stirî û çûşkê

Tu ya xweşî newroza
min

Wek dilên pak
Wek hizrên çak
Wekî stêraw
Heyva Ronak

Tu dê minî newroza
min

Wek şehîda
Wek Barzanî
Mem û zîna
Ehmedê xanî
Tu namirî newroza min



Helbest



Çûça li hêlinê
Hafî ber firrînî
Firr bide aqarî
Vî aqarê tarî
Aqarê Duhokê
Li rex kanî
Yê bê xefk û dave
Dade hemû ala
Hemû bike hevala
Heval hene zorin
Ciwan û bisporin
Li wana yek yeke
Silavên min lê ke
Hemû per hejînin
Bila ew bixwînin
Bo roja buharî
Xemla daru barî

Buhar

Mihemed Emîn Doskî

103
Mihemed Emîn Doskî